Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1258 | 23-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Bi zuhabûna Gola Urmiyeyê re çavkaniyên dahatê tune dibin



**Zuhabûna Gola Urmiyeyê ji ber guherîna avhewayê di aliyê çavkaniya dahatê ya jinên herêmê de jî bûye sedema gelek zorî û zehmetiyan. Jinên ku çavkaniyên wan ên dahatê nemane, berê xwe didin karên alternatîf.**

Gola Urmiyeyê ku yek ji golên herî mezin a xwê ye li cîhanê, ji ber guherîna avhewayê û kêmaniya çavkaniyên avê û rêveberiya xirab a rayedarên hikumetê zuha dibe. Li Îranê 5'ê Adarê ji bo di mijara rewşa Gola Urmiyeyê û hewldanên zindîkirina golê de, weke rojeke hişyariyê hatiye diyarkirin. Ev hewldana ku bi salan e bi awayekî rêgezî nehatiye meşandin, rê li ber krîza herî mezin a hawîrdorê li herêmê vekir.

### Zuhabûna golê dê bandorê li ser bi hezaran jinên xebatkar bike

Krîza ku tê jiyîn bi giştî aborî, civakî, û siyasî hwd û  bi hemû aliyan ve hatiye destgirtin, bi taybetî di demên krîzê de ji ber destekek guncaw ji bo jinan tune ye. Yên zêdetir ji vê pirsgirêkê ziyanê dibînin jin in. Ji ber ku pirsgirêkên aborî, çavkaniya gelek pirsgirêkan in, ev rapor astengî û pirsgirêkên aborî ku çavkaniya xwe ji vê krîzê digre û bandorê li jinan dike digre dest. Lê belê dema rastiya heyî li ber çavan were girtin dê were dîtin ku zuhabûna golê wê badorê li ser debara bi hezaran jinên li Îran û bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê bike.

### Çavkaniyên debarê yên jinan tune dibin

Li korta Gola Urmiyeyê nêzî 5-6 milyon mirov dijîn, ji vana zêdeyî ji sedî 60 li gundan in. Piraniya gundiyan, bi taybetî jin, dahata xwe bi çandinî û lawirvaniyê dikin. Jinên ku li gundan dijîn di bazarên çandinî, baxçevanî û lawirvaniyê de, roleke girîng dilîzin. Zuhabûna golê û bi kêmbûna çavkaniyên avê re piraniya jinan çavkaniyên xwe yên dahatê winda kirine.

### Zuhabûna golê bandor li çandinî û gelek qadan kiriye

Yek ji van jinan Masume B, ye, li gundê Gola Qareh ê nêzî Gola Urmiyeyê dijî. Masume B. ya ku bi salan e lawirvaniyê dike, dema neçar ma koçî bajarê Urmiyeyê bibe, nikaribû karê xwe bidomîne.

Ji şêniyên gund Marhamatabat Shaidaz bi gotina: "Bahozên tozê û bayê qadên çandiniyê û ava di çalan de anîn halê xwê" anî ziman ku çavkaniya wê ya dahatê nemaye.

Krîza aborî ya ku rasterast bandorê li dahata jinan kiriye, li ser xebatên jinan jî ziyan çêkiriye. Şêniya Urmiyeyê Shahreh K. ku bi hilberandina kax re mijûl dibe diyar kir ku bihabûna hinek fêkiyan û kalîteya kêm, bandorê li karê wê kiriye û destnîşan kir ku piraniya fêkiyan ji welat û bajarên derve tîne. Ameneh A. ya ku di fabrîqeya şîr a xwecihî de dixebite jî anî ziman ku bi zuhabûna golê re xelaya şîr a her sal çêdibe xirabtir dibe û ev jî bûye pirsgirêkek mezin.

### Zuhabûna golê rê li ber pirsgirêkên tendûristiyê vedike

Di nava mirovên ku ji ber pirsgirêkên hawirdor ku li korta golê tê jiyîn neçar mane koçbikin yan jî çavkaniya dahata xwe winda bikin, pirsgirêkên aborî, tendûristî û civakî kurtir dibe. Mînak zuhabûna golê di jinan de rê li ber nexweşiyên bi rêya nefesê, nerehtiyên cild û çav, zêdebûna nexweşiyên dil demar, gurçik û pirsgirêkên helandin, penceşêr û gelek pirsgirêkên tendûristiyê vekir. Ji ber maliyetên zêde hinek nexweşî butçeya malan derbas dike.

### Gel berê xwe dide karên alternatîf

Di salên dawî de li hemberî krîza zuhabûna golê de jinên ku li qadên gundewar ên herêmên cûda hewl didin li ber xwe bidin. Jinên li hinek gundan dijîn, dest ji hilberandina berhemên weke zebeş ku gelek av dixwaze berdane. Ji ber pirsgirêkên di çandiniyê de, jin weke alternatîf atolyeyên dirûnê vedikin, mêr jî dest bi karên weke marangoz kirine.

### Pêwîstî bi tedbîrên destekê hene

Di heman demê de gundên li derdora Gola Urmiye, bi projeyên pêşxistina kapasîte perwerde ji jinan re tê dayîn û derbarê zuhabûna golê de bername tên pêşxistin. Lê belê ji derveyî plansaziya derbarê restorasyona Gola Urmiye de, bi armanca parastina hawirdor ji bo jinên li van herêman çavkaniya dahatê û serbixwebûna xwe bi domînin pêwîstî bi planên hê berfirehtir û tedbîrên destekê heye.

**NÛ JINHA**

# Dînîtiya Pîroz: Vegotina berxwedana jinan

**Navenda Nûçeyan**

**Pêşangeha 'Dînîtiya Pîroz', ji xebatên îllustrasyon ên Bahar Badakhshan pêk tên berxwedana jinan vedibêje.**

Pêşangeha Dînîtiya Pîroz a Bahar Badakhshan, hestên kûr û tevlîhev ên jinan nîşan dide. Jinên ku neçar mane bêdeng bijîn, lê di tabloyan de demên wan ên ku bilind dibe xuya dike. Wêneyên di pêşangehê de birînên ku di beden û ruhê jinan de hene, evînên wan, veqetîn û tenêtiya wan vedibêjin. Ev tenêtî, bi bêdengiya kûr a sîrayetê berheman kiriye xwe hîs dike lê ev bêdengî, bêçarebûn û bêhêvîtî nîn e; dijberî wê, ji nû ve rabûna ser lingan û baweriya ji bo destpêkên nû ye.

Ev berhem tenê jiyana Bahar Badakhshan nîşan nadin; di heman demê de behsa hemû jinên ku rastî zoriyan hatine lê tu carî serî netewandine dike. Pêşangeh, êşên jinan ên veguherîne hunerê, birînên ku bi hezkirinê hatine pêçan û tevî hemû astengiyan hêza xwe parastine vedibêje. Pêşangeh, hem êşên jinan hem jî hêza wan nîşan dide.

Bahar Badakhshan, di warê restorasyonê de xwedî lîsana bilind û



di warê grafîk de jî xwedî asta lîsansê ye. 10 sal in, di warê îllustrasyon de dixebite û 27 sal in perwerdeya hunerê dide. Bahar Badakhshan a ji ajansa me re behsa xebatên xwe yên hûnerî kir wiha got: "Di civakê de jin pir kêm tên dîtin, daxwazên xwe naynin ziman, her dem fedakariyê dikin û gelek caran xwe ji bîr dikin. Ev mijar her dem di serê min de bûn. Ez bi xwe jî ji ber jin bûm min gelek zorî jiyan kirin û ji ber wê min xwest hestên xwe bi berhemên hunerê vebêjim. 10 sal in îllustrasyon çêdikim û pênc-deh salên dawî bi awayê dîjîtal dixebitim."

### Wate û konsepta berheman

Bahar Badakhshan, der barê berhemên di pêşangehê de got ku îllustrasyon bi kûrbûna li ser hinek mijaran tên afirandin, xwedî awayê kevneşopî yên cuda ne û got:

"Ev xebat îllustrasyon in û tişta ku wan ji wêneyan vediqetîne, vegotina mijareke diyarkirî ye. Mînak dîmenên ku di pirtûkên zaroka de tên bikaranîn, dibin alîkar ku zarok çîrokê bi wêneyan fam bikin. Min van îllustrasyonan ji bo kesên temenê wan mezin çêkir. Li bin tabloyan, nivîsên ku wateya her berhemê vedibêjin hene. Van berheman bi awayê dîjîtal hatin çêkirin û bi tabletên grafîk li ser wan xebat çêbû. Berhemên ku bi teknîkên berê hatin çêkirin (boyaxên şil, pênûsên rengîn, teknîkên têkel) tenê carek dikarin werin kopyakirin lê berhemên dîjîtal gelek caran dikarin werin çapkirin."

### Eleqeya mezin a hunerhezan

Vebûna pêşangehê li bajarê Sine, ji aliyê hunermendên jin ve rastî eleqeyek mezin hat. Jinên hunermend, bi wêne, helbest û nivîsên xwe raman û têkoşîna xwe nîşan didin.

Dema ku mirov bi kûrahî li van berheman dinêre, dibîne ku mirov dikare ji bêderfetiyan derfet û hêviyê biafirîne. Hêvî ne tenê xeyalek e; rastiyeke ku jin bi hunera xwe teşe didin û dixin pratîkê ye. Jin bi riya hunerê, civaka xwe ya îdeal dikin xêz dikin û vê îdealê vediguherînin rastiyê.

### Sudoku: Bersiv 32

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 3 | 7 | 5 | 4 | 8 | 9 | 1 | 2 |
| 8 | 5 | 9 | 2 | 7 | 1 | 4 | 3 | 6 |
| 2 | 1 | 4 | 3 | 9 | 6 | 7 | 8 | 5 |
| 1 | 7 | 5 | 4 | 6 | 9 | 8 | 2 | 3 |
| 3 | 9 | 8 | 7 | 5 | 2 | 1 | 6 | 4 |
| 4 | 2 | 6 | 8 | 1 | 3 | 5 | 7 | 9 |
| 5 | 8 | 1 | 6 | 3 | 4 | 2 | 9 | 7 |
| 7 | 6 | 2 | 9 | 8 | 5 | 3 | 4 | 1 |
| 9 | 4 | 3 | 1 | 2 | 7 | 6 | 5 | 8 |

### Sudoku:Pirs 33

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 5 | 8 | | | | | | |
| | | 9 | | 5 | | | 1 | 8 |
| 2 | | 1 | | | 7 | | | |
| | 2 | | | | 4 | 9 | | 1 |
| 1 | 7 | | | 9 | | | 3 | 5 |
| 8 | | 6 | 1 | | | | 2 | |
| | | | 5 | | | 1 | | 3 |
| 6 | 3 | | | 1 | | 4 | | |
| | | | | | | 8 | 9 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER HEVSENGÎ Û WEKEHEVBÛNÊ**

**Asinê wan ji hev digire:**
- Mîna hev in; nêrînên wan ji hev digirin; dikarin tev de bixebitin.

**Baz bi bazan, qaz bi qazan, mirîşka kor bi dîkê kulek re:**
-Divê her kes bi hemkûfê xwe re be; her kes bi yê weke xwe re baş e.

**Berûyên darekê ne, şêlimên mişarekê ne:**
- Tev weke hev in; ti ferq di nava wan de nîne.

**Bila ne bist bişewite ne kebab:**
- Bila her du alî jî zererê nebînin.

**Bizin bi lingê xwe mî bi lingê xwe:**
- Gunehê her kesî jê re ye; her kes cezayê sûcê xwe dikişîne.

**Çavên wî ji yên wî ne reştir in:**
- Ji wî ne biqîmettir e; ne ji wî baştir e; ne ji wî zanatir e.

**Çi ber li serî çi ser li berî:**
- Her du jî weke hev in; ti cudayî di navbera wan de nîne; her du jî zerer in.

**Çi ker biçe ber bar çi bar biçe ber kerê:**
- Her du jî yek in; encama her duyan jî yek e; ti ferq di navberê de nîne.

**Dîkê kor ji mirîşka kor re baş e:**
- Tiştên weke hev, mirovên weke hev ji hev re dibin.

**Ez goşt naxwim, ezê nanê xwe bi ava wê bixwim:**
- Her du tişt jî weke hev in; ha te ew kir, ha ew.

**Ez goşt naxwim ezê nanê xwe li ava wê hilînim:**
- Bi heman wateyê.

**Firavîn nan û dew, şîv dan û dew:**
- Heman tişt in; ti cudabûn nîne.

**Ha kevir li cêr ket, ha cer li kevir ket:**
- Her du jî weke hev in.

**Hemû berûyên darekê ne pîvazên mişarekê ne:**
- Tev weke hev in; ti ferq di nava wan de nîne.

**Her du pîvazên mişarekê ne:**
- Weke hev in; ti cudayî di navbera wan de nînin.

**Hesinê wan yek e:**
- Mîna hev in; nêrînên wan ji hev digirin; dikarin tev de bixebitin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Tara Husên: Em ê xwedî li banga Aşitî û Civaka Demokratîk derkevin



Çalakvana siyasî ya Başûrê Kurdistanê Tara Husên diyar kir ku peyama Rêber Apo, peyamek giranbiha û dîrokî ye, îro li tevahiya cîhanê deng vedaye û wiha got: "Peyam ne tenê ji bo gelê kurd e, ji bo aştî, jiyana hevbeş û rawestandina rijandina xwînê ye.**R-3**

## 'Reşnivîsa Destûrê dîktatoriyeke nû ye'

**Parêzer Qeherman Îsa diyar kir ku piştî hilweşandina rejîma Baas hêviya hemû pêkhate û gelên Sûriyê hebû ku destûrek bê pejrandin li gorî daxwazên wan be.R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1258 | 23-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# JIN BINGEHA CIVAKA DEMOKRATÎK E

Têkoşîna azadiya jinê ku encama azweriya jiyana azad û têkoşîna Rêber Apo ye, di jina kurd de vîn û hişmendiyeke girîng li pêş xist. Jinan pêşengiya jiyaneke bi rûmet, azad û têkoşîneke bi heybet li xwe girtin û bi rêve birin. Bi cesareteke mezin hêvî mezin kirin û çanda demokratîk li pêş xistin. Jin îro jî pêşengiyê ji serdema aştî û civaka demokratîk re dikin û tekez dikin ku serdema civaka demokratîk serdema jina azad e. Li ser wê bingehê jin pêşengiya pêvajoyê dikin û bi israr in ku civaka demokratîk ava bikin.**R-2**




## Piştî 6 salan ji rizgarkirinê, xeteriya DAIŞ'ê berdewam e




23'ê Adarê salvegera 6'emîn a rizgarkirina Baxozê ji DAÎŞ'ê ye. Ji bo ewlehiya tevahî cîhanê, beriya 6 salan QSD'ê bajarokê Baxozê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kir û  wekî erdnîgarî di destê çeteyan de nema.**R-6**


## 'Banga Rêber Apo piştgirî da gelê kurd'



Nivîskar Berzo Mehmûd da zanîn ku banga Rêber Apo piştgirî da tevahiya gelê kurd û got, "Eger xwesteka dewleta Tirk a aştiyê hebe divê şerê çekdarî rawestîne, herwiha Rêber Apo û rêhevalên wî azad bike.**R-7**



**Newroza 2025'an**
Ahmet Aktaş R-4



**Newroz û cejin**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

## 'Çapemeniya Sûriyê xwe disipêre zihniyeta desthilatdariyê'



Hevseroka Yekîtiya Ragihandina Azad Evîn Îbrahîm da zanîn ku ragihandina desthilatdariya Sûriyê li gorî hişmendiya desthildatdariyê kar dike û wiha got: "Ragihandina Azad wê ji bo tevahî gelên Sûriyê heqîqetê eşkere bike."**R-4**

# Zelal Cîger: Civaka Demokratîk bi jinê pêkan e

Endama Desteya Serokatiya Partiya Sûriya Pêşerojê Zelal Cîger diyar kir ku ji bo jin bikaribe sîstema Netew-Dewlet hilweşîne, têkoşîn û asta zanebûna azadiya jin girîng e, ji bo wê jî berya hertiştî pêwîst e jin di rêgezên îdeolojiya azadiya jin de xwe kûr bike û hevjiyana azad pêk bîne. Rêber Apo jî dibêje: 'Dîroka koletiya jin hîn nehatiye nivîsandin, dîroka azadiya jin jî li benda nivîsandinê ye.'

**Amara Baran/Qamişlo**

Di derbarê girîngiya rola jin di avakirina Civaka Demokratîk de, endama Desteya Serokatiya Partiya Sûriya Pêşerojê Zelal Cîger ji rojnameya me re axivî.



### Pirsigirêka jin ji pirsgirêka kurd kûrtir e

Zelal Cîger diyarkir ku Rêber Apo di salên dirêj de dema ku dest bi şoreşa azadiyê kir, rol da jin ê û wiha domand: "Bi destpêkirina Tevgera azadiyê heta niha Rêber Apo tevlîbûna jin û hişmendiya azadiya jin derxist pêş, di nameya xwe ya ku di 8'ê Adarê de ji bo jinan şandibû jî, dibêje ku 'Pirsgirêka jin ji pirsgirêka kurd kûrtir e', ew jî tê wateya ku 5 hezar salin jin wek kolê yekemîn tê naskirin, dî dîrokê de jî bindestê yekemîn ku yekemîn hat kolekirin jin bû, ew pirsgirêk jî ji bo me pirsgirêka yekemîne ku em tenê nikarin wek netewek an jî wek welatekî lê meyze bikin. Heta ku pirsgrêka azadiya jin neyê çareserkirin em nikarin pirsgirêka civakê jî çareser bikin. Ji bo ku hişmendiya azadiyê pêş bikeve Rêber Apo ji bo jinan dibêje ku 'dev ji tiştên sade, mijarên ku jin kole dike, xerîziyên cînsî û tekîliyê navbera jin û zilam de yên ku jinê lawaz dike pêwîste xwe jê rizgar bikin û li gor wî jin kesayeta xwe ji nûve ava bike. dema ku jin xwe jiwan kevneşopiyan rizgar kir wî deme hebûn, îrade û nasnameya xwe derdixe pêş".

### 'Fikrê Rêber Apo di tevahî jinan de guhertin da çêkirin'

Zelal Cîger da zanîn ku Rêber Apo ji bo tevahî jinan gelek gûhertin da çêkirin û wiha got: "Di wan 50 salên dawiyê de gelek tevgerên femînîst derketin lê belê wan tevgeran nekarîn ku Tevgerê Jin bilind bikin, tenê bi beşekî jinên xwendevan re sînordar man. Di Rojhilata navîn de jî gelek rêxistinên jinan hatin avakirin lê nekarîn guhertinekê di kok bidin çêkirin. Rêber Apo di sîstema ku da avakirin de, jin ji koletiyê rizgar kir û bi rengekî paqij kirasê azadiyê lêkir, di fikir û mêjiyê jinê de şûştinek da çêkirin ku ew jin hêza wê heye ku her tiştî bike û hemû xebatan de cîh bigre. Gelek caran ji bo jinê digotin ku jin darê şiketiye, jin bê hêze, lê Rêber Apo da ispatkirin ku jin çiqas xwedî fikrek xort û bi hêz e. Li Rojavayê Kurdistanê bi tekoşîn û berxwedaniya YPJ'ê, li çiyayên Kurdistanê jî bi berxwedanî û tekoşîna YJA-STAR'ê bi qehremantiya bi sedan pêşengên azadiyê ku di vê dozê de şehid bûne ji dunyay re dan ispatkirin ku hebûna, îrade û helwesta jin bixwe re azadiyê tîne. Fikir û felsefeya Rêber Apo guhertin di sekna jinê û tevgera jin de da çêkirin, îro jina kurd pêşengiyê dike û hemû jinên pêkhateyên din di nav xwe de dihewîne."

### 'Sirê serkeftina şoreşê, tevlîbûna xurt a jinê ye'

Zelal Cîger wiha domand: "Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê jinan bi tekoşîna xwe û bi saya fikre Rêber Apo ew zîhniyeta paşverû tekbir û heta astekê derbaskir. Jin ji bo ku bikaribe hên xurtir civakê bi rêve bibe û destê Rêber Apo xurtir bike, berpirsiyartiya ku dikeve ser milê jin ew e ku asta ku gihaştiyê hîn zêdetir zanebûna xwe pêş bixe. Pêwîste di sîstema hevserokatiyê de jin bi awayekî aktîf rola xwe bileyîze û asta zanabûna xwe ya kar xûrt bike. Heta niha jin di hemû xebatên siyasî, dîplomasî û leşkerî de serkeftin qezenc kirine, îro jî tekez sira serkeftina şoreşê tevlîbûna xurt a jin e."

### 'Sedsala 21' mîn sedsala zanist û azadiya jine'

Zelal Cîger wiha domand " jin pişte ku gihaşt asta zanebûnê zanistî pêre hat çêkirin helbet gor wî pêwîste tekoşîn bide meşandin. guhrtina zilam ne hêsane ji ber ku zilam zû bi zû dev ji desthilatdariya xwe bernade, heman demê de ji bo jin jî derbastare jin jî zû zû dev ji koletiya xwe bernade, jina ku Rêgezên azadiya jin naskiribe dikare di hemû qadan de û di hemû xebatan de pêşengtî bike. Mirov çiqas ji bo azadiyê tekoşîn bike kême, ji ber sînorên azadiyê tuneye. ji bo wî jî perwerde ji bo her jinek esas û girînge ku di aliyê fikrî de asta zanebûnê xortir bike. Sedsala 21'mîn sedsala zanistî û azadiya gelên bindeste herwiha sedsala azadiya jine wê jin bi pêşengtiya xwe sîstema Netewa demokratîk mîsoger bike.

### 'Di sîstema netew -dewlet de rola jin dernakeve'

Zelal Ciger balkişand ser nêzîkatiyên sîstema Netew Dewlet ji jinê re û wiha domkir: "Sîstema Netew-Dewlet sîstemeke ku her çiqas rêngê wê yên jin be, lê mêjiyê wê temsîla jinê nake, ew jî bixwe re pirsgirêkan tîne, wek ku maf dane jinê dide xuyakirin lê di rastiyê de tiştek bi vî rengî nîne. Di sîstema kapîtalîzmê de jin wek susekî li ser maseyê tê bikaranîn. Sîstema Netew dewlet 5 hezar sal in li ser jinê tê ferzkirin. Di wan salên dirêj de jin di milê cinsî de wekê kole ew şikandin û heta roja îro de jî wê xerîzeya jin derdixîne pêş. Ya herî rast ew e ku jin li hemberî rastiya mêr kesayeta xwe bide avakirin. Ger jin rastiya koletiyê û azadiyê nasnekiribe, wê nikaribe helwestek jî bide nîşandan. Bi hezara jinên xwendevan hene lê sîstema desthilatdar qebûl dikin û sere xwe ditewînin."

### Ji bo ku sîstema netew dewlet bê hilweşandin pêwîstî bi naskirina dîroka azadiya jin heye

Zelal Cîger di dawiyê de wiha got: "Rêber Apo jî dibêje, ' "Dîroka koletiyê nehatiye nivîsandin û dîroka azadiya jin li benda nivîsandinê ye', ji bo ku em sîstema netew dewlet hilweşînin pêwîste em dîroka azadiya jin binivîsin, ger em dîroka azadiyê bi pênûsê binivîsin, divê em berya hertiştî di jiyana xwe de dîrokê sererast bikin. Berxwedanî û tekoşîna jin li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de li ser tevahî Sûriyê bandor kir. Piştî hilweşîna Rejîma Baas di Sûriyê de rejîmek dîtir hat temsîla Îslama paşverû dike li hemberê wî cara yekemîne ku di Sûriyê de jin li hemberî desthilatdariyê helwest dide nîşandan sebaba ku jin bertek nîşan da û dengê xwe kirin yek û bi yek dengê qîr kirin ew bû, ji ber ku Bakûr û Rojhilatê Sûriyê pêşengtî ji giştî jina Sûriyê re kir, guhertinên ku di Bakûr Rojhilatê Sûriyê de çêbûn li ser tevahî Sûriyê bandor kir. Ji berxwedaniya Sakîne Cansiz heta berxwedaniya Şervîn û Şîlan û hemû qehramanên tekoşîna azad heta ku îro digîhîje Keram ku wek jinek Ereb ku di berxwedaniya bendavê de cîh girt û şehîd ket. îro li sûriyê de yek helwestbûna jin vî da diyarkirin."

# 'Reşnivîsa destûra nû berdewamiya hişmendiya Baasê ye'

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Jinên bajarê Qamişlo daxwaz kirin ku reşnivîsa destûra nû ya Sûriyê bê guhertin, li şûna wê destûreke azad û demokrat ku hemû pêkhateyên Sûriyê bihewîne, bê nivîsand.**

Di 13`ê meha Adara 2025`an de Komîteya Destûrî ya Sûriyê ku ji aliyê desthlatdariya Şamê ve hatine erkdarkirin, reşnivîsa destûra qonaxa demkî radestî Serokkomarê Sûriyeyê kir, reşnivîs bi tundî ji hêla piraniya pêkhateyên Sûriyê hate red kirin ji ber ku bi yek rengî hatiye nivîsandin û pêkhateyên dîtir paşguh dike, mafê gelê kurd bi giştî hate dûrxistin vê yekê hişt ku gelê kurd di riya daxuyaniyên fermî helwesta xwe ya neqebûlkirinê diyar bike, herwiha li gel vê yekê bi hezaran gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê "Bakur û Rojhilatê Sûriyê" protesto kirin û reşnivî şermezar kirin.

Di reşnivîsê de navê dewleta Sûriyeyê wekî "Komara Erebî ya Sûriyeyê" dê bimîne û ti guherîn lê nayê kirin. Di reşnivîsa destûrê de hatiye destnîşankirin ku Îslam jêdera sereke ya yasayê li Sûriyeyê ye, zimanê erebî yê fermî ye û zimanê pêkhateyên din hatin dûrxistin.

Li gorî daxuyaniya komîteyê, di qonaxa destûrî ya nû de, desthilat dê di navbera parlamento û serokkomariyê de were parvekirin. Parlamentoy dê desthelata yasayî bike lê desthelata cîbicîkar jî di destê serokkomar de be.

ENKS`ê eşkere kir ku Erebî weke zimanê fermî yê welat hatiye destnîşankirin û behsa Kurdî û Suryanî nehatiye kirin.



Şêrîn Bîlal



Şemis Enter

Di heman çarçoveyê de jinên bajarê Qamişlo jî reşnivîsa destûra Sûriyê ya nû red kirin.

### 'Divê destûreke demokrat were avakirin'

Jina bi navê Şêrîn Bîlal ji bajarê Efrînê ye niha li Qamişlo jiyan dike, diyar kir ku ew destûra ku pêkhateyên dîtir paşguh dike qebûl nake, daxwaz kir ku gelê kurd mafê xwe bidest bixe di nava destûra nû de û wiha got: "Divê destûrekeazad û demokrat were avakirin, em ê derkevin kolanan heta bidestxistina mafê xwe û pêkhateyên din, na ji Sûriya navendî, erê ji Sûriyeke ne navendî, demokratîk pirrengî."

Şêrîn Bîlal wiha lê zêde kir: "Piştî salên dirêj ji zilmê weke gelê kurd û Sûrî em li bende bûn ku destûreke bi edaletî were avakirin, tê de hemû ol û etnîkên heyî di Sûriyê de cihê xwe bigrin bêyî paşguhkirina hebûna wan."

### 'Destûreke bi yek rengî nayê qebûl kirin'

Çalakvana femînîst Şemis Enter jî daxwaz kir ku reşnivîsa destûra nû bê guhertin û wiha berdewam kir: "Ev reşnivîs cihê mixabiniyê ye ji bo tevahiya pêkhateyan, weke gelê kurd duyemîn di dewleta Sûriyê de cih digrin tu maf ji me re nehatiye diyar kirin. Destûra ku hate raghandin berdewamiya zihniyeta rêjîma Baas e, 14 sal me şoreş li dar xist ne ji bo em vegerin xala destpêkê. Em bi hêvî ne ku dengê me bighêje desthilata Şamê bi taybet di nava kolana Sûriyê de, reşnivîsa destûra nû ya Sûriyê bê guhertin û mafê pêkhateyan bê diyar kirin."



# 'Banga Rêber Apo piştgirî da gelê kurd'

Nivîskar Berzo Mehmûd da zanîn ku banga Rêber Apo piştgirî da tevahiya gelê kurd û got, "Eger xwesteka dewleta Tirk a aştiyê hebe divê şerê çekdarî rawestîne, herwiha Rêber Apo û rêhevalên wî azad bike. Herwiha divê hemû aliyên kurdî ji bo biencamkirina vê pêvajoyê bibin piştgir."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di çarçoveya meşandina pêvajoya Aşitî û Demokrasiyê de Rêberê Gelan Abdullah Ocalan di 27'ê Sibatê de bangeke dîrokî kir.

Rêber Apo bi vê bangê bala hemû cîhanê kişand, dewleta Tirk xist rewşeke ku divê AKP û MHP'ê li gorî pêvajoyê bimeşin. Di roja îro de pêvajo û banga Rêber Apo di rojevê de ye û bi kûrahî tê nîqaşkirin.

Derbarê pêvajoyê û banga Rêber Apo rewşenbîr û nivîskarê kurd Berzo Mehmûd ji rojnameya me re axivî.



### 'Banga Rêber Apo piştgirî da gelê kurd'

Berzo Mehmûd da zanîn ku banga Rêber Apo piştgirî ji bona tevahiya gelê kurd e, divê hemû aliyên kurdî ji bo meşandina vê pêvajoyê bixebitin û wiha domand: "Niha em dibînin ku pêvajoyeke aştiyê di navbera kurd û tirkan de tê meşandin, MHP'ê û AKP'ê ji aliyê gelê tirk ve ne û ji hêla din ve Rêber Apo nûnertiya gelê kurd dike. Gava ku Rêber Apo ji bo pêkanîna aştiyê û demokrasiyê avêtiye ji bo tevahiya kurdan bû pişt da ku gelê kurd mafê xwe bi dest bixe. Herwiha bû destpêkek ji bo pêkanîna jiyaneke aştiyane di navbera gelê kurd û tirk de. Niha me dît ku PKK'ê ji bo hemû cîhanê ragihand û eşkere kir ku wê şerê çekdarî li dijî dewleta Tirk rawestand. Lewma jî hetanî ku pêvajo bidurstî bidome divê dewleta Tirk jî şerê xwe yê çekdarî li hemberî gelê kurd û PKK'ê rawestîne. Em naxwazin ku dîse dîrok xwe dubare bike û gelê kurd bên xapandin. Ev pêvajoya ku Rêber Apo dest pê kiriye, ji bo tevgerên azadîxwaz ên kurd li Bakur, Başûr, Rojava û Rojhilatê Kurdistanê dibe hêzek da ku bikaribin bixebitin, da ku ev pêvajo biencam bibe divê hemû aliyên kurdî jî piştigiriya vê pêvajoyê bikin."

### 'Tirkiyê neçar e ku mafê kurdan bide'

Mehmûd tekez kir ku dewleta Tirk neçar e mafê kurdan bide û wiha axivî :"Di serdema kevnar de mîrinşîn û impratoriyên kurdan li Bakurê Kurdistanê hebûn, ev impratorî şêweyek ji şêweyên rêvebirina fedrialî û otonomî bû ku gelê kurd herêmên xwe li nik gelê tirk û impiratoriya osmanî bi rê ve dibirin. Herwiha ziman û rewşenbîriya kurdî ne qedexe bû, tu pirsgirêk di navbera kurd û tirkan de nebûn. Lê bi dirêjahiya dîroka dewleta Tirk, lîstk û xapandin li ser gelê kurd ji hêla Tirkiyê ve hatiye kirin. Dewleta Tirk di Peymana Lozanê de ev yek bi serê kurdan kir, lê berî wê di Peymana Sîvir de, tirkan peymanek li ser aboriya Kurdistanê îmze kirin û bi mercê dayîna mafê kurdan, lê di Lozanê de tirkan hemû peyman red kirin, kurd bi vê yekê gelekî êşiyan. Ji Lozanê heya niha kurd li Bakurê Kurdistanê ji mafê xwe bêpar in. Piştî destpêkirina Şoreşa Bakurê Kurdistanê ji salên 80'î ve heya roja îro bi serkêşiya Rêber Abdullah Ocalan, di roja îro de dewleta Tirk neçar maye ku gelê kurd qebûl bike û mafê kurdan bide wan."

### 'Eger xwesteka Tirkiyê û aştiyê hebe divê şerê çekdarî rawestîne'

Rewşenbîr û nivîskar Berzo Mehmûd anî ziman ku eger nêta dewleta Tirk û aştiyê hebe divê şerê çekdarî rawestîne û wiha bi lêv kir: "Eger nêta dewleta Tirk a ji bo aştiyê hebe gereke hin gavan bavêje, ji bo ku Rêber Apo bikaribe bi derdora xwe re têkiliyan çêbike û di kongreyê PKK'ê de amade be di serî de Rêber Apo azad bibe. Di heman demê de bi hezaran siyasetmedarên kurd di zindanan de ne, mîna Selahedîn Demirtaş û hwd… mayîna Rêber Apo û siyasetmedarên din di zindanan de wê bibe astengiyek ji pêvajoyê re. Wekî em dizanin Rojhilata Navîn li ber guhertinekê ye, dewleta Tirk metirsdar e ku ji vê guhertinê bêpar bimîne, pê re jî têkilî di navbera dewletê û gelê kurd de çêbibe. Ev qutbûyîn jî wê nekeve xizmeta berjewendiyên dewleta Tirk, ji encama vê yekê jî wê dewleta Tirk lawaz bibe û were rûxandin. Eger kurd ji erdîngariya Tirkiyê cuda bibin wê Tirkiyê têk biçe, lê eger kurd li gel hemwelatiyên Tirkiyê bijîn wê dewleteke xurt ava bibe. Lê ya herî girîng ew e ku mafê kurdan ên çandî, siyasî û hwd… mîna gelê tirk werin dayîn û perensîbên, netewa kurdî li gorî taybetmendiyên kurdan maf ji wan re bê dayîn. Em dibînin xwendingehên tirkan hene, li nik wan divê dibistan, zanîngeh û peymangehên kurdan jî hebin. Kurd ne tirk in, tirk jî ne kurd in, cudahiyeke dîrokî û çandî heye, lê mercên erdîngarî herdu milet di herêmekê de komkirine, bi vî awayî çênabe sîstema çînayetiya netewî hebe û netewa tirk li ser hesabê netewa kurdî bijî."

# 'Muzîk dermanê rojên xweş û ne xweş e'

**Dîlan Mulhim\ Qamişlo**

**Tembûrvan Hisên Hesen diyar kir ku ew bi rêya muzîkê hest û ramanê xwe tîne ziman, herwiha ew bi rêya muzîkê êş û derdê xwe ji bîr dike û wiha got: "Muzîk dermanê rojên xweş û ne xweş e."**

Hunera Kurdî ya dewlemend bi dengbêjî û stranbêjiyê bi sedan salan hatiye parastin û di bîra civakê de maye. Her gel bi çand û hunera xwe tê nasîn, mirovên ku hunera wan tunebe nasnameya wan jî tune ye. Gelê Kurd jî bi hunera xwe tê nasîn, her hunermendeke, stranbêjek û tembûrvanek bi stranan parastina hunera Kurdî dikin, û dihêle ku zindî bimîne. Lewma di parastina çand, huner û nirxê gelê kurd de hunermend, tembûrvan û stranbêjên ciwan ên Kurd rolek mezin lîstin e. Ciwanên kurd ji bo parastina mîrata çandî ya kurdî kedeke mezin dane. Di heman demê de li Rojavayê Kurdistanê bi Hunermendên xwe yên ciwan dewlemend e û bi taybet jin, zarok û ciwan, herwiha yek ji wan ciwan in Tembûrvan û Stranbêj Hisên Hesen e.

### Kurt e jiyana Tembûrvan û Stranbêj Hisên Hesen

Tembûrvan Hisên Hesen di sala 2007`an de li bajarê Serê Kaniyê ji dayîk bûye, herwiha piştî ku Serê Kaniyê hate dagirkirin koçberî bajarê Hesekê bû. Xwendina xwe ya seretayî dema niha li bajarê Hesekê dewam dike û di heman demê de ew li Hesekê jiyan dike. Hezkirineke wî ya mezin ji muzîkê re heye û muzîk li cem wî xwedî wateyeke mezin e.

Di derbarê jiyana xwe ya hunerî de, Tembûrvan û Stranbêj Hisên Hesen ji Rojnameya me re axivî.



### 'Muzîk di xweşî û nexweşiyê de hevalê jiyana min ne'

Hisên Hesen anî ziman ku ew ji biçûkaniya xwe ve ji muzîkê hezdike û wiha got: "Dema ku ez biçûkbûm min tembûr li ser destê xwe çêdikirin û lîstika ku min gelekî jê hez dikir çêkirina tembûrê bû. Malbata min dît ku hezkirineke min a mezin ji muzîkê re hebû ji ber vê yekê tembûr ji min re kirî. Di heman demê de cîranekî me yê tembûrvan hebû bi navê Faris bû, nêzî 20 rojan li cem wî min perwerdeya muzîkê dît. Bi domana demê re min xwe bi xwe fêr kir û asta min pêş ket, piştir e ez derbasî navenda Çand û Huner a bajarê Serê Kaniyê bûm, herwiha dema ku ez derbasî navendê bûn û min tembûr dît ez gelekî kêfxweş bûm. Muzîk ji bo min weke rêhevalekê durist e û ez gelekî pêve girêdayî me, herwiha ez bi riya muzîkê êşa xwe derdixim. Di xweşî û nexweşiyê de muzîk hevalê jiyana min e, dema ku ez kêfxweş bim ez li tembûrê lêdixim hîn bêtir kêfxweştir dibim. Dema ku ez nexweş jî bim tembûr bi min re dibe alîkar û bi riya wê ez nexweşiya xwe jibîr dikim. Di heman demê de muzîk gelekî berfirehe tu carî bila kes nebêje ez gihiştime asteke bilind, çiqas mirov muzîkê zanibe dîsa jî jêr e divê, ez dema niha çi qas zanim lê hîn jî ez dixwazim ku li pêş bikevim. Bi rastî muzîk sûdeke mezin li mirovan dike, ji ber mirov dikare bi riya muzîkê hest û ramanê xwe bîne ziman."

### 'Muzîk aramiyê dide canê mirov'

Tembûrvan Hisên Hesen da zanîn ku muzîk aramiya canê mirov e û wiha bi dawî kir: "Her mirovek bi rengekî cuda ji muzîkê hez dike, herwiha huner parçeyek ji jiyana mirovan e, dengê muzîkê yek ji wan dengan e ku mirovan dixe nava aramiyeke bêsînor de. Her kes di jiyana xwe de rastî astengiyan tê, helbet astegî di jiyana min de jî derbas bûne. Pêwîst e kesê ku xwedî xeyal, dev ji xeyalên xwe bernedin û çiqasî rastî astengiyan jî werin pêwîst e riya xwe berdewam bikin, ji ber ku her tişt bi israrê pêk tê. Ez bi hêvî me ku muzîk alîkar be ji bo vî welatî û bi taybet tembûr, ji ber ku Tembûr ji çanda kurdî ye, herwiha em weke nifşê nû yê civakê, bi stran û hunera xwe, çanda û civaka xwe ya kevnar diparêzin. Divê her ciwan tirsa di hundirê xwe de derbas bike û li hunera kurdî xwedî derkeve, herwiha pêwîst e ciwan girêdayî çand xwe bin û xwedî lê derkevin û ji bo ku çanda me were parastin û winda nebe."

# 6 sal li ser rizgarkirina Baxozê derbas bûn

23'ê Adarê salvegera 6'emîn a rizgarkirina Baxozê ji DAÎŞ'ê ye. Ji bo ewlehiya tevahî cîhanê, beriya 6 salan QSD'ê bajarokê Baxozê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kir û wekî erdnîgarî di destê çeteyan de nema.

**Navenda Nûçeyan**

23'yê Adara 2019'an de Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi hevkariya Koalisyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê bi merasimeke girseyî li Heqil Umer ê bakurê rojhilatê Dêrezorê serkeftina leşkerî ya li dijî DAIŞ'ê li bajarokê Baxozê yê Dêrezorê ragihand ku devera dawî ya di destê DAIŞ'ê de mabû hate rizgarkirin.

Beriya 6 salan piştî rizgarkirina hemû Kobanê û Reqayê ji tevahî terora DAÎŞ'ê, DAÎŞ berê xwe da gundewarê Dêrezorê û xwestin xwe li wir bi rêxistin bikin. Hêzên Sûriye Demokratîk ji bo rizgarkirina bajaroka Hecîn a Dêrazorê û gundewarên wê, di çarçoveya Pêngava Bagera Cizîrê de qonaxa Şerê Tunekirina Terorê da destpêkirin. QSD'ê piştî ku bi temamî herêm ji sivîlan vala kir Operasyon bi alîkariya Kowalisyona Navnetewî destpê kirin. Di wir de bi hezaran ji çeteyên DAÎŞ'ê hatin kuştin û bi deh hezaran ji malbatên wan derbasî herêmên bi ewle bûn.




**Daxuyaniya Îlankirina Rizgarkirina Baxozê**

Di wê demê de îlankirina rizgarkirina Baxozê bi daxuyaniyekî hate kirin. Di daxuyaniya ragihandinê de Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdî gotibû: "Şerê Kobanê yê bûye sembola berxwedana li dijî DAIŞ'ê, di heman demê de bû destpêka xelasbûna DAIŞ'ê. Piştî 5 salan DAIŞ li qadê bi binkeftineke mezin têk çûye. Me 52 hezar kîlometre axa Sûriyeyê azad kir. lê xetera şaneyên wê li ser herêmên me û cîhanê hê dewam dike."

**DAÎŞ çawa derket?**

Dîroka derketina DAÎŞ'ê li Îraqê vedigere sala 2003'yan û dema Ebû Miseb El-Zerqawî rêxistina "Cîhad û Tewîd" ku di Îlona 2003'yan de ava kirî.

Rêxistina teror di gelek pêvajoyan re derbas bû heta "Dewleta Iraq a Islamî" sala 2006'an bi serkêşiya Ebû Umer El-Bexdadî hat ragihandin. Piştî kuştina Ebû Umer El-Bexdadî sala 2010'an Meclisa Şêwirî Ebû Bekir El-Bexdadî wek emîrê nû hilbijart.

Bi destpêka Bihara Erebî û belavbûna wê li Sûriyê re, El-Bexdadî ev wek fersendeke mezin dît ku derbasî Sûriyê bibe û ferman da çeteyên xwe yên li Sûriyê ku şaxekî rêxistina El-Qaîde lê ava bikin. Navê rêxistinê pişt re bû "Cebhet El-Nusra".

Di 8'ê Nîsana 2013'an de, rêxistinê piştrast kir ku "Cebhet El-Nusra" ew dirêjb[na beşdarbûna wê di şerê navxweyî yê Sûriyê de ye . weke yek ji çaxên wê di Sûriyê de û "Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê" weke navekî nû ji bo yekbûna xwe bi Cebhet El-Nusra re ragihandin. Ku bi kurte nava xwe ya heyî DAÎŞ tê naskirin.

Piştî vê ragihandinê DAÎŞ'ê serê sala 2014'an dest bi dagîrkirina xaka Îraqê kir, Felûca, Remadî, Musil û Tekrît dagîr kirin. Serê sala 2013'an ketin bajarê Girê Spî yê Bakurê Sûriyê û 2014'an Reqa, Eyn Îsa, Minbic, beşek ji Dêrezorê. 15'ê Îlona 2014'an bere xwe da Kobanê.

Hêjayî gotinê ye ku Lîderê çeteyên DAÎŞ'ê Ebû Bekir El-Bexdadî dawiya Cotmeha 2019'an bi operasyoneke hevbeş ya QSD û Koalosyona Navneteweyî li gundewarê Idlibê hat kuştin.

**Têkçûna DAÎŞ'ê di Kobanê de**

Ji ber hovîtiya DAÎŞ'ê li Îraqê û hin deverên Sûriyê ti hêz li hemberî wê nesekinîn. Lê li Kobanê têk çû. Di encama berxwedana bêhempa ya şervanên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ku 134 rojan dewam kir, cara yekemîn DAÎŞ şikest û yên mayîn ji Kobanê reviyan. Bi vê re rê li ber şkestina DAÎŞ'ê li Sûriyê û Iraqê vebû.

Bi avakirina Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) re li Bakur û Rojhilatê Sûriyê 10'ê Cotmeha 2015'an koalisyonê destek da vê hêzê. Lewre ya herî rêxistinkirî û li dijî DAIŞ'ê ya herî bi hêz bû.

Piştî Kobanê, avakirina QSD'ê xaleke duyemîn a binkeftina DAIŞ'ê li Bakur û Rojihlatê Sûriyê ye. Ji dîroka damezirandina QSD'ê rêzeserkeftinên li dijî DAIŞ'ê ji Holê, heta Şedadê, Minbic, Tebqa, Dêrazorê û gundewarê bakurê bajarê Dêrazorê pêk hatin. Bajarokê Baxozê baregeha dawî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku di destê DAIŞ'ê de mabû, 23yê Adara 2019'an hat rizgarkirin.

## Newroz û cejin



Hafiz Ahmet Turhalli

Îsal Newroz û cejna Remezanê ketine heman mehêde. Ji bo mirovên ku li Rojhilata navîn dijîn û bi taybet gelê Kurd, ducaran kêfxweşî û şahiye. Rojhilata navîn ev bi sedan salane dinale, birîndare û her diçe nalîna wê zêdetir dibe.

Misilman bi giştî û gelê me bi taybetî her salan cejnan derbas dikin, lê nikarin bigihîjin aramî û aşitiyê.

Cejna Remezanê ji ber însanên bindest ji bê edaletiya serdestan azad bun ev cejn hate pîroz kirin. Lewra di nîvgrava Erebistanêde mirovên ku desthilatdarbûn, bi navê baweriyan, xapandin, şêlandin û zilm li ser civakan pêkdianî. Bi firotina baweriyan û bi navê Xweda ticarekî bê sînor û bê exlaq pêk dianî. Dema Qur'an nazil bû û Pêxemberê me SXl dest bi erka xwe kir, kesên bi tundî li dij Îslamê derdiketin, kesayetên bi navê ol û baweriyan bûn. Ev kesan bi zanebûn civak bi navê ol/olan dixapand û hebûna madî û keda wan ji destê wan derdixist. Weke mînak kesê herî zêde qaşo oldarbû, Welîdê kurê Muxîrebu ji hêla mal û samanê de serkirdeyê xelkê bajarê Mekkê û Taîfê bû. Gellekî bandora wî li ser civaka Ereb hebû. Kesê herî zêde Qur'an bi awayekî sergirtî behsa wî dike û rexneyên giran lê dike jî Welîdê kurê Muxîrebu.

Hz. Muhemed silavê Xwedê li wî heval û hogirên wî be, têkoşîna despêkê dijî van kesên zalim û xwînmij pêşxistin. Ji ber di meha remezanê de Qur'an daket, bîr û baweriyek pak di nava civakê de hate înşa kirin cejna Remezanê li bajarê Medînê pêk hat. Cejna remezanê kêfxweşiya azadiya dinê û axeretê ye.

Newroz jî weke tê zanîn; têkoşîna dijî qiralê Asuran Dehakê zalim, serkeftina milletên rojhilata navîn bi giştî, ya milletê Kurd bi taybetiye.

Cejn rojên serkeftinên rasteqînî yên milletan, çi cejnên olî û çi jî cejnên netewî bin.

Pirsgirêkên cîhana Îslamî ewin ku karibin xwe û ola xwe ji destên olfiroş û xwînmijan azad bikin. Ji ber di destê desthilatdar û olfiroşande ol û cejn ji naveroka xwe hatine durxistin û pêşketinên berbiçav jî nikarin werin pêkanîn.

Ola Îslamê dibêje; nekuje, nedize, derewan neke, destdirêjiyê neke, nexapîne, parve bike, hevkarê başîyêbe, destê bindestan bigre, pêdiviyên wan pêk bîne, xwedan rawişt be û bibe ji çêkiroxan (salihan). Dema kesayet di meha remezanê de ev exlaq tesbît kir û ev exlaq jixwere kir jiyan, wê demê tu cejna rastîn pîroz dikî.

Newroz jî her weha têk birina Dehakan, serkeftina Kawayane. Newroz piştî têkoşîneke dûr û dirêj vegeriya ser rastiya xwe.

Hêjî desthilatdar ji bo vê heqîqetê desteser bikin hêka dişkînin, ji ser agir baz didin û hesin dikutin. Lê gelê me û gelê bindest piştî vê têkoşîna dijwar, naveroka Newrozê têr û tije derbas dike. Neha em pir nêzî azadiyêne. Divê gelê me naveroka herdû cejnan jî dagire. Cejn azadbûna ji koletiyane. Dibe ev koletî bi rengekî maddî an jî manewî be. Ger em zincîrên koletî û cehaletê bişkînin, emê karibin xweşikbûna cejnan jî dagrin.

Çi cejnên olî bin an netewî bin, divê bêhna azdiyê, huzurê, dadmendîyê û kêfxweşîyê were dîtin. Cejnên olî ji bo azadiya ji gunehan û nebaşiyan tê pîroz kirin, cejnên netewî jî divê ji bo azadiya Netewan werin pîroz kirin. Herdû cejnên kesên azad pîroz bin.

# Li Kobanê pêngava çandina daran

**Desteya Ekolojî ya Kantona Firatê di 4'ê Adarê de dest bi çandina daran kir û dê heta 4'ê Nîsanê rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bidome.**



Hevseroka Desteya Ekolojî ya Kantona Firatê Almaz Romî diyar kir ku yek ji xebatên beşa ekolojî çandina daran e û wiha berdewam kir: "Yek ji xebatên beşa ekolojî ya herî girîng çandina daran e, ji bo vê jî Desteya Ekolojî her sal dest bi çandina daran dike. Ji meha 9'an heta meha 1'ê em tov kom dikin û ji meha 1'ê şûnve em daran diçînin heta 4'ê Nîsanê. Îsal em amadekariyan dikin ku li malbat, sazî û welatiyan daran belav bikin ji bo bajarê me şîn bibe û hejmarê daran zêdetir bibe."

Almaz Romî, der barê çandina daran de wiha got: "Dema ku rejîma Baasê li vir bû tu girîngî nedida daran û çandiniya daran, tenê çend cureyên daran li vir hebûn kêm cure dihatin dîtin. Niha Desteya Ekolojî gelek cureyên daran çandin, gelek darên fêkiyan me çandine. Darên ku li ser vê axê şîn dibin me çandin ji ber ku me ceribandin çi cureyên daran li vir dibin û me yên ku dibin çandin û cureyên wan pir kirin. Heta 4'î Nîsanê em ê bidomînin jixwe piştî meha Nîsanê hewa germ dibe êdî dar nayên çandin."

**3 hezar û 600 dar hatin çandin**

Almaz Romî diyar kir ku ji bo Rêberê Gelê Kurd dar pir girîng in ji bo vê her sal di rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de daran diçînin wiha berdewam kir: "Jixwe Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pir girîngî daye beşa ekolojiyê ji ber ku sê tiştan bingeh digre, yek jê ekolojî ye. Dibêje jin xwe bi çandina daran û ekolojîyê azad dibînin ji bo vê jî her sal di rojbûna Rêber Apo de em hemû cureyên daran diçînin û girîngiyê didin vê rojê. Çalakiya ku me dest pê kir ji bo roja 8'ê Adarê bû li gundê Minazê yê girêdayî bajarê Kobanê me 100 dar çandin. Li Girê Miştenûr me çandina 10 hezar daran plan kiribû lê li wir nêzî 3 hezar û 600 dar hatin çandin ji ber êrîşên dewleta Tirk ên li ser herêmê em nikarin baş karê xwe bikin loma me hejmar kêm kirin."

**Zarok di mijara ekolojîk de tên perwerdekirin**

Almaz Romî diyar kir ku ji bo bêhtir girîngiyê bidin daran, hemleya xwe li dibistanan jî dest pê kirine ji bo hişyariya zarokan dane meşandin û wiha bi dawî kir: "Bêhtir ji bo girîngiya daran û xemilandina kolanan weke Desteya Ekolojî me dest bi hemleya li dibistanan perwerdekirina zarokan kir. Ji bo zarok girîngiyê bidin daran û çandiniya wan ji bo vê jî divê em zêdetir xwedî li çandina daran derkevin û hişyariyê di nava zarokan de belav bikin. Ji bo vê jî perwerdeya me ya zarokan berdewam dike û di aliyê çandiniyê de jî xezabên me berdewam dike." **NÛ JINHA**



# Tara Husên: Em ê xwedî li banga Aşitî û Civaka Demokratîk derkevin

Çalakvana siyasî ya Başûrê Kurdistanê Tara Husên diyar kir ku peyama Rêber Apo, peyamek giranbiha û dîrokî ye, îro li tevahiya cîhanê deng vedaye û wiha got: "Peyam ne tenê ji bo gelê kurd e, ji bo aştî, jiyana hevbeş û rawestandina rijandina xwînê ye.Em ê heta dawiyê xwedî li banga aşitî û demokrasiyê derkevin."

**Têkoşîn Amara/ Qamişlo**

Derbarê girîngiya banga Rêberê Gelan Rêber Abdullah Ocelan, çalakvana siyasî ya Başûrê Kurdistanê Tara Husên ji rojnameya me re axivî.

**'Me bi çekan ispat kir ku kurd hene'**

Tara Husên diyarkir ku Rêber Apo 26 salin di girtîgeha îmraliyê de, di bin pergala îşkence û qirkirinê de tê ragirtin, rûxmê wê jî heta niha tu daxwazê wî ji bo xwe şexsî çênebûye. Tişta ku daxwaz kiriye ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo gelê Tirk bi tevahiye û wiha got" Rêber Apo bi rastiya xwe û bi cewherê xwe şikandina dogmatîzimê bi awayek xwe nûkirin weke babetekê digre dest. Biryara çek dayinê jî di paradîgma Rêber Apo de çek her tiştek parastinê nîne, ger civakek xwedî hişmendiya xweparastinê be çek ji bo wî yek aliye. Mînaka herê berbiçav Şengale, rûxmê ku çek hebû jî gel nedikarî xwe biparêze, di heman demê de di roja me ya îro de li bendava Şehîdan rûxmê ku di destê gel de çek nîne, lê ji ber ku zîhniyeta xweparastinê heye û rêxistinkirina sistema Netewa Demokratîk heye û bê çek xwe diparêzin. Ji bo wê Rêber Apo dibêje "partiya ku me bi çek destpêkir li hemberê hewildanên qirkirina tunekirina gelê kurd çek rakiriye û îro me biryara seknandina şer girt, ji bona ku em isbat bikin ku gelê kurd dikare şer, aşiti û siyasetê jî bike. Ji ber ku em gihaştine wê astê ku nasnameya xwe ya kurdî isbat bikin û bi cîhanê jî bidin pejirandin. Ger ku dewleta tirk bersivê nede banga Rêber Apo wê demê wê cîhan bi rengekî baş bizanibe kî şer dixwaze û kî aşitiyê dixwaze.



**Rêber Apo îro xwedî însyatîf û nexşeriya Rojhilata navîne**

Tara Husên got ku gelê kurd cara yekeme ku di asta cîhanê de bi bandore hem ji aliyê siyasî ve hem jî ji aliyê dîplomasî ve di sedsala 21'mîn de jî me dît ku gelê kurd bi çi awayê hat parçekirin û bi avakirina sîstema dewlet netew re carekedin mafê kurdan hat binpêkirin û bê maf, bê statû hat hiştin û wiha domand" Rêber Apo berya niha jî nav li pêvajoyê kiribû û gotibû ku gelê kurd di nav şerê cîhanê yê sêyemîn de derbasdibe. Heta niha tu dewlet û hêz muhra xwe li sedsala 21'mîn nexistiye ji derveyî Rêber Apo tu kes ji bo çareseriyê destê aşitiyê dirêj nekiriye. Dewleta tirk ji ber ku bê bandor maye, raste rast berê xwe da îmraliyê li cem Rêber Apo. Rêber Apo baş dizane ku rewş berbikûve diçe, ev 26 salin ku di nav çar dîwaran de bi lêkolîn û analîzên xwe pêvajoyê bi awayekê zelal lêkolîn dike û bi taybet jî 10 salên dawiyê ku têkiliyên wî bi malbat û parêzeran re qut bûye, lê ruxmê wê jî, ji aliyê sosyolojî û dîrokî ve pirskirêkên gelê kurd û gelên din jî dixwaze çareser bike û ew di vî warî de xwedî wê hêz û baweriyê ye.

**Dewleta Tirk bi girtin û qirkirinê dixwaze destkeftiyan ji holê rake**

Tara Husên bibîrxist ku "Dewleta Tirk jî baş dizane ku ancax Rêber Apo rewşa heyî çareser bike, dewleta tirk piştî 2015'an heta niha bi awayekê pir dijwar êrîşên heremên parastina medya kir û di heman demê de êrîşên gelek gundên Başûrê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê kir û bi wan êrîşan dixwast ku destkeftiyên gelê kurd têk bibe. Li Bakurê kurdistanê bi hezaran mirovên welatparêz siyasetmedar girtin û avêtin zindanan û gelek şaredarî desteser kirin û hevserokên wan avêtin zindanan û heta ji destê wê tê dijîtiya gelê kurd dike. Armanca wê tunekirina tevgera azadiya gelê Kurd e. Lê gelê kurd û tevgera azadiyê belavî hemû cihanê bû û carekedin xwe û hebûna xwe ispatkir.

**'Rêber Apo dixwaze alûziya heyî çareser bike'**

Tara Husên wiha got Rêber apo dixwaze qonaxa heyî wek firsetekî bikarbîne ne tenê ji bo xizmeta gelê kurd ji bo tevahî gelên tirkiyê û gelê kurd bikar bîne ku rê nîşanek pêşkêş bike û wiha anî ziman" dewleta Tirk niha neçar maye ku behsa aşitiyê dike baweriya Rêber Apo bi projeya wî û tevgera azadiyê û gelê wî heye ku ji bo aşitiyê gav davêje. peyama Rêber Apo, peyamek giranbiha û dîrokiye di giştî cîhanê û Rojhilata navîn de deng veda ye û ew peyam ne ji bo gelê kurd tenê ye, ji bo aşitiyê û bihevre jiyankirina hemû gelan e. Bi hezaran salin ku em bi gelê tirk re û gelê rojhilata navîn re jiyan dikin. Kesên ku fitnê dikin nav gelên rojhilata navîn de sîstema emperyalîzma sermayederiya cîhanê dakû qazanca xwe pêk bîne, di encama şer de ne gelê kurd karibiye bigîhêje armanca xwe ya serkeftinê ne jî gelê tirk karî ku bi darê zorê gelê kurd asimile bike ku di nav sîstema dewlet netewe yên tirkiyê de bihelîne. Rûxmê ku di şer de zerera wê di serî de gelê Kurd tîd û gelek komkujî li ser hatin meşandin û gelek leşkerên tirk jî hatin kuştin, lê di encamê de pêwîste ku şer raweste û çareserî pêkwere. Angu di encamê de hêzên sermayedar ji vî şerî sûd wergirtin, ji ber ku ew li ser alûziyên di nava gelan de siyaseta xwe bi rêve dibin û planên xwe didin meşandin.

**'Rêber Apo ji projeya xwe bawer e '**

Tara got ku "Dewleta Tirk jî dizane ku Rêber Apo çiqas bi projeyên xwe bawer e, çiqas xwedî projeyên çareseriyê ye. Projeyên Rêber Apo ne nûne bi salane li ser difikire pirtûka Rêber Apo ya bi navê nexşereya Rê heye li ser esasê çareseriyê û aşitiyê û ji bo jiyanek demokratîk, li gel hemû îmkanên xwe di nav çar dîwaran de têkoşîn dike. Rêber Apo niha nûnertiya 50 milyon însanê dike ji ber wî jî naxwaze ew biryara girîng a dîrokî bi tena xwe li ser gelê rojhilata navîn bide, ji ber wê jî heyeta DEM partî li ser biryar û pêşniyarên Rêber Apo serdanê partiyên desthilatdar yên tirkiyê kirin piştre jî derbasî Başûrê Kurdistanê bûn û bi çend partiyên desthilatdar re hevpeyvîn kirin û peyamên Rêber Apo gîhandin wan, Rêber Apo dixwaze bihevre biryar li ser çarenûsa gelê xwe bidin, her projeyek em bi yekîtî di nav xwe de, derbas bikin wê proje hîn bêtir serkeftîtir bibe û encam bigre. Ji bo wê jî hemû partiyên siyasî pêşwaziyek baş kirin û gotin ku çi erk bikeve ser milê me em amadene ku bikin, êdî di dem pêş de emê bibînin ku çiqas erka xwe pêk tînin. Di dema pêş de emê bibînin ku çiqas gavên pratîkî tên avêtin, di aliyê civakî de civak li başûrê kurdistanê bûbû dû parçe, perçeyek ku hindek Rêber Apo nas dikirin manifestoya wî xwendibûn, angu naskirinek hebû, lê di civakê giştî de ji ber ku mînakên nexweş li başûrê kurdistanê hatibûn rûdan tirsek hebû ku weke sala 1974'an ku mele mistefa aş betal ragihand ku herkes çû mala xwe gelek însanê şoreşger bê hêvîbûn ji vê pêvejoyê. Ji milekî din ve jî hindek ji civaka me baş proje nasnekiribû ji bev wê yekê tirsekî wan hebû, lê niha li başûrê kurdisrtanê hêviyekî pir xort di civakê de avabûye.

**'Bangawaziya Rêber Apo ji bo rojhilata navîn girîng e '**

Tara balkişand li ser giringiya bangawaziya Rêber Apo û got "li ser daxwaz û bangawaziya Rêber Apo erka partiyên siyasî kesayet rewşenbîr û her ferdekî civakê li her beşekî kurdistanê taybet li başûrê kurdistanê erkekê pir girîng û dîrokiye ku li statûya xwe û maf û zimanên xwe xwedî derkevin. Proje û bangawaziyên Rêber Apo çiqas ji bo bakûrê kurdistanê girînge ewqas ji bo başûr jî girînge, bandora xwe jî



gelek heye, bi salane ku dewleta tirk li başûrê kurdistanê gelê sivîl dike armanç û komkujiyan pêk tîne gundan xira dike û îro bi sedan gund li başûrê kurdistanê vala bûne. Em wek başûrê kurdistanê sud ji peyama Rêber Apo digrin, ji bo wê jî herkesek berpirsyare ku rola xwe bileyêze. Rêber Apo jî dixwaze em wek gelê Mezobotamya û gelê Rojhilata navîn di çarçoveya netewa demokratîk de bi hevre jiyan bikin. Ev 26 salin Rêber Apo xwedî li vê nexşerêyê derdikeve û bi hemû hestên xwe pê bawere û dixwaze vê yekê di meriyetê de pêkbîne. Peyama Rêber Apo peyamek pir girînge û her ferdekê ku li rojhilata navîn jiyan dike erka ku dikeve ser milî pêwîste ji bo aşitî û civaka demokratîk ji bo tirkiye, îran, iraq û sûriye têkoşînê bike, em dizanin ku êdî modêla dewlet netew têkçûye û êdî dem dema aşitî û civaka demokratîk e.

**Peyama 8'ê Adarê ji bo tevahî jinan bû Hêz**

Tara Husên di dawiya axaftina xwe de balkişand ser peyama 8'ê Adarê ku Rêber Apo ji bo jinên cîhanê şandibû kir û wiha domand "peyama 8'ê Adarê ya Rêber Apo li başûrê kurdistanê bandorek mezin li ser jinan kir û Rêber Apo bê ku cûdahî bike nav pêkhateyan de hemû jin hatin pêşwazîkirin. Taybet li ser medya mecazî çar tayên Nêrgizên ku Rêber Apo ji bo jinan diyarî kiribû deng veda û herkesek spasiya xwe pêşkêşî Rêber Apo kirin. Jin û aşitî, jin û jîngeh her tim yekin û bihevdû ve girêdayî ye, ji bo avakirina sîstema demokratîk bi hizir û hestên jin zindî dibe. Dagirkirina axê dagirkirina jin di yek xetê re derbas dibe, ji bo wê çiqas ji bo gel û civakê aşitî û Demokrasî pêwîste ewqas ji bo jin jî girînge. Ji bo hevjiyana azad û bihevre jiyankirinê girîng e. Di vê qonaxa nû de erk û têkoşîna jin ew e, ku bi rengekî xort beşdar bibin û xwedî li manifestoya Rêber Apo derkevin."

# ‘Çapemeniya Sûriyê xwe disipêre zihniyeta desthilatdariyê’

Hevseroka Yekîtiya Ragihandina Azad Evîn Îbrahîm da zanîn ku ragihandina desthildatdariya Sûriyê li gorî hişmendiya desthildatdariyê kar dike û wiha got: “Ragihandina Azad wê ji bo tevahî gelên Sûriyê heqîqetê eşkere bike.”

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Piştî hatina rêjîma nû ya Sûriyê, aloziyên heyî pêhtir kurtir bûn û tu çareserî ji bo gelên Sûriyê pêş neket. Bi taybet di van demên dawiyê de bi hinceta bermahiyên Rêjîma Baas qirkirina etnîkî li ser gelê Elew pêk hat. Bi hezaran kez ji 80 salî heyanî zarokê yek salî hatin kuştin û sirgûnkirin. Desthilata Şamê qaşo da ragihandin ku kesên van komkujiyan pêk tînin ne girêdayî wan e û wê hesab bê xwestin. Lê heyanî niha jî tu hesabxwestin û lêpirsîn nehatine kirin.

Têkildarî bûyerên dawiyên yên ku li ser Elewiyan hatine pêkanîn û rola çapemeniyê Hevseroka Yekîtiya Ragihandina Azad Evîn Îbrahîm ji rojnameya me re axivî.



**‘Sîstemên dîktator pirrengiya netewan napejrînin’**

Evîn da zanîn ku Rêjîma Sûriyê ji kevin de pirrengiya civakan di nava xwe de napejrîne û wiha got: “Rêjîma Baas bi dehan salan li ser serweriya Sûriyê ma, di van salên durûdirêj de gelek komkujî û kiryarên dij mirovî di derheqê pêkhateyên herêmê de kirin. Sîstema Baas yek ji sîstemên dîktator yê ku li ser yek al, yek netew, yek ziman hatibû avakirin, yên ku dijberî vê yekê jî derkeve wê helbet were tunekirin û qetilkirin. Yek ji netewên ku di nava vê sîstemê de hatibû winda kirin jî gelê Kurd bû ku bi dehan salan bê nasname û weke hemwelatiyên Ereb dihatin pênasekirin. Di salên 60’î de 150’î hezar Kurd ji mafê wergirtina nasnameyê hatibûn bê par kirin. Her wiha nakokiyên ku dixwestin di navbera kurdan û ereban de derxînin û Kembera Ereban jî mînaka herî zindî ye, her wiha Serhildana Qamişlo ku di sala 2004’an de gelê Kurd li hember neheqiya Rêjîmê rabû ser piyan. Yanî sîstemên dewlet netew yên dîktator tu carî pirrengiya netewan di nava xwe de napejrînin û rêjîma Baas vê yekê piştrast dike.

13 sal di ser aolziya Sûriyê re derbas bû, di nava aloziya Sûriyê de bi perjirandina xeta sêyemîn gelê Kurd li ser bingeha Konfedralîzma Demokratîk bi bedelên giran gelek destkeftî di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi dest xistin û di bin siya Rêveberiya Xweser de gelek pêkhate jiyan dikin.”

**Sîstema heyî çiqas ji alozî û gelê Sûriyê re bû bersiv?**

Evîn bal kişand ser zihniyeta desthilatdariya Şamê û wiha gor: “Piştî 13 salan Rêjîma Baas hate rûxandin, helbet ev yek ji bo gelê Sûriyê cihê kêfxweşiyê û weke ku desthildatdarî tune bû hate jiyankirin, rûxmî ku ev kêfxweşî demkî bû jî lê gelê Sûriyê weke roja serfiraziyê dîtin. Êdî bi wê rûxandinê re rêjîma ku hatiye ser serweriyê gelo çiqas ji pirsgirêkên gelê Sûriyê re bû bersiv, çiqas ji aloziya Sûriyê re bû çareserî. Ev yek jî bi demê re hate dîtin ku çiqas ji hev du xirabtirin û gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe temenê vê yekê dide. Pirsgirêka cidî niha tê jiyan kirin, piştî rûxandina rêjîma berê ka niha çi di Sûriyê de û li ser gelê Sûriyê tê qewmandin ew girîng e. Mixabin kesên ku hatine ser serweriyê kesên girêdayî rêxistinên El Qaîde bûn, kesên tundrew in û yên ku cihê xwe di nava DAÎŞ’ê de girtine. Bi taybet Cebhet El Nusra ya ku rola herî sereke di aloziya Sûriyê de leyîstiye; niha cihên xwe di hikumeta nû ya Sûriyê de digrin. Bi navê Îslamê niha derketine pêş û dixwazin sazûmaniyeke nû ji Sûriyê re bidin avakirin. Ev kesayetên bi vê rengî yên ku dîroka wan şahidiyê ji piratîka wan re dike, nikarin Sûriyeke demokratîk û azad ava bikin, weke ku gelê Sûriyê hêvî dikir.”


**Di Sûriye nû de jin ji hebûn û mefê xwe bê par e**

Her wiha Evîn diyar kir ku bi gavên destpêkê jin hate tune hesibandin û wiha pê de çû: “Bi hatina HTŞ’ê re tu pêşveçûn nehatin jiyan kirin. tersî wê me dît ku çawa rola jin di civakê de tune kir, gelo bi vê zihniyetê Sûriye ber bi ku ve diçe? me bi xwe jî weke rojnamevan kiryarên ku li ser jin hatine kirin; hatin belgekirin û nîqaşên me hatin kirin û siyaseta ku li ser jinê tê meşandin me qebûl nekir. Şêwazê ku niha tê bikaranîn weke tevgera komên çeteyan û yê DAÎŞ’ê ye, Ji ber vê yekê jî ha em niha dibînin çi bi serê gelê Elewî li Sahila Sûrî tê kirin.

Bi taybet em Ragihandina Azad kêlî bi kêlî ji komkujî û bûyerên ku dihatin pêkanîn me dişopandin. Bi rastî tişata ku li wir tê kirin derveyî pêvan û exlaqê mirovahiyê ye. Bi hinceta ku ew gel girêdayî rêjîma Esed ne hatin qetilkirin, em bala xwe bidinê ew zarokê yek salî heyanî kîjan astê girêdayî rêjîma berê bû? di sekna her jinekê de ku li ber serê zarokê xwe yê kuştî rûniştî ye hezar çîrok tê dîtin. Gelo çi gunehê van mirovanan heye. Her wiha bi derxistina destûra nû re ka cihê jin û pêkhateyên din yên li Sûriyê li kuye? Ê tevgera wan ya heyî tu derfeta ku bibe çareserî ji gelên Sûriyê re nade.”

**Bang li QSD’ê kirin, dîtina çareseriyê di Netewa Demokratîk de ye**

Rojnamevan Evîn da zanîn ku Pirojeya Netewa Demokratîk hêza çareseriyê ye û wiha got: “Bi herikîna 13 sala ji Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re yak u bi bedelên giran buha em serkeftin û destkeftiyên heyî dibînin; hatiiye avakirin. Di vê pêvajoyê de QSD’e bû hêviya gelên bindest yên Sûriyê. Bi taybet bi komkujiyên Elewiyan re me dît ku çawa bang li QSD‘e hate kirin bang li Rêveberiya Xweser hate kirin ku li hember qetlîama li ser gelê Elewî tê kirin bisekinin. Ev yek jî xwestek û dengvedana şoreşa Rojavayê Kurdistnê û modêla Rêveberiya Xweser ya ku hemû pêkhate, netew û zimanan di nava xwe de dihewîne diyar dike. Sûriye ji gelek netew û pêkhateyan pêk tê, û rêjîma heyî bi terzê heyî nikare mûzeyîka Sûriyê biparêze.”



**‘Em ê her bêjin em dengê gel in’**

Evîn ragihand ku bi riya çapemeniyê tirsê avadikin û wiha pê de çû: “Ragihandina Desthilatdariyê jî piropagandeya komkujî û qetlîamên ku dikin didin diyar dikin. çawa ku li ser Medya Civakî kokujiyên pêk tînin belavdikin. Ev yek jî siyaseta wan û hişmendiya wan piştrast dike. Em weke ragihadnin lê dinêrin ku bi hin rojnamevan û bi riya ragihandinê gefan dikin û tires di nava gelan de avadikin. Di demekê de ku îro Ragihandina Azad ku li Bakur û Rojhilatê sûriyê bi rêve diçe. Em bi domdarî dibêjim em dengê gelin, ger em dengê gelin em dikarin li hember her cure tundî, tunekirin, kiryar û sûcan derkevin. Ev ragihandin ji bo gelan hatiye avakirin ji bo derxistina rastiyê û teşhîrkirina pilanên dijmin. Her wiha ragihandina jin a ku li ser fikirên Netewa Demokratîk hatiye avakirin, ji bo azadiya jin û misogerkirina mafê wê her li qadan têkoşîna derxistina heqîqetê dike.”

Rojnamevan Evîn Ibrahîm axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Raya Giştî û rêxistinên navnetewî çavên xwe li hember komkujiyên derheqê civaka Elewî de tê kirin girtine. Heqîqeta Rêjîma heyî bala her kesî dikşîne, ka heyanê kîjan astê li hember komkujiyên ku pêk tînin bûn bend. Tavahî cîhan û hêzên navnetewî li hember kiryar û desthilatdariya nû bê deng e. ev yek jî ji meşandina berjewendiyên wan bi hev re diyar dike. Erka li ser Ragihandina Azad ku li bingeha xwe li ser azadiya jin xebat dike, em ê li gorî fikirên Rêber û avakirina civakeke demokrat û aştî. Em vê desthilatdariyê napejrînin, bê guman ji bo tevahî gelên Sûriyê emê her li ser şopa derxistina rastiyê bin.”



## Newroza 2025’an

**Ahmet Aktaş**

Li goreyê tê xuyakirin Newroza îsal, ji ya hemû salên derbasbûyî bi coştir, mezintir û berfirehtir hat pîroz kirin, tê pîroz kirin û wê hîn jî werin pîroz kirin.

Jixwe hema mirov dikare bêje meha Adarê, bi tevayî bûye meha Newrozê. Bê gûman pîrozbahiya Newrozê li Amedê hat tacîdar kirin û ew gotina “Milyon li qada Newroza Amadê bûn” careke din hat dîtin û ne kêm belê bi her awayî, bi coş, bi ruh, bi bang, bi govend û hema ji her aliyê erênî bi zêdeyî hat pîroz kirin. Bê gûman di vê mehê de bûyerên dilêş û xemgîn jî hene, lê belê her xemgîniyê jî, bi xwe re berxwedan û xweragiriyên hîn mezintir afirandine.

Navê Newroza îsal Rêber APO wisa nav lêdanî: newroza aştî û cıvaka demakratî! Belê gelê me jî wisa bersîv da û got: Newroza azadIya Rêber APO!

Di hemû pîrozbahiyan de û bi taybetî jî li Newroza Amedê, pir zelal hat dîtin ku him gelê me û him jî nexasim jinan û ciwanan, cewherê peyama Rêberê xwe baş hildabun, lewma bêqusûr, pêşewazî li NEWROZÊ kirin û wisi diyar dibe ku wê hîn jî xurtir bersîvê bidin peyama Rêberê xwe.

Em bînin bîra xwe Rêber APO gotibû; “me ne bêwate di vê rojê de dest bi PKKê kir”! Vê gotinê li ser civîna destpêkê ya Newroza 1973yan a Bendava Çubuka Enqereyê dibêje. Lewma mirov bi hêsanî dikare bêje; hest û hilwesta gel û dostê xwe ya erênî û vê coşa bilind, nîşan dide ku pîrozbahiya Newroza 2025an gihişt wateya herî bilind. Her wiha ev qonaxek nuh a şoreşa Kurdistanê nîşan dide.

Ka em bala xwe bidin hilwesta dewleta tirka ya li vê pêvajoyê.

Weke tê zanîn Devlet Bahçeli hinek gotinên qelew pêşkêş kir, Receb Erdogan jî hinek bi şermokî be jî got “ez li gel gotinên Bahçelî me”! Lê belê paşê weke rawesttiya bin û bûbin temaşevan.

Hema hema mirov dikare bêje aliyên Kurdistanî û dostên xwe bi tevayî li gel banga Rêber APO cih girtin, lê aliyê dewletê AKP-MHPê ji rastiyê dûr dimînin, weke ku dudil in!

Gelo dibe ku li bende hilwesta gel û dostên xwe ya di Newrozê de derkeve holê de bin?

Va ye hilwesta Tevgêrê, gelê Kurdistanê û dostên xwe li ber çava ye. Êdî AKP-MHP, ya wê weke pêvajoya berê, disa danstandinê hilweşînin, ya jî wê vê carê rastiyê qebûl bikin, li ser dika Aştî û Civaka Demokratik pêvajoyê dewam bikin. Hilbet li vira divê bandora siyaset û hilwesta “eqlê jor” jî neyê jibîr kirin, AKP-MHP bêyî wan nikarin gavên stratejik bavêjin.

Lê vê carê şerd û mercên nêz jî û yên dûr jî, naçarî lihevhatinên nuh in. Lewma dibe ku vê carê ev pêvajo neyê hilweşandin. Ji ber ku her alî hewcedarên hev in û wisa diyar dibe ku hêza gelê Kurdistanê û Rêveberiya wê weke kilîta çareserkirina pirsgrêkên herêmê ye, aliyan pirtir havcedarî hevalbendiyan dike. Lê dîsa jî divê aliyê Kurdistanî, bi amadekarî tevbigere.

Li ser vê bingehê, pêşî yê pîrozbahî pirtir heq kirniye li Rêber APO, gelê Kurdistanê û dostên xwe, gelên herêmê û mirovatiyê, NEWROZ pîroz be!



# ‘Reşnivîsa Destûrê dîktatoriyeke nû ye’

Parêzer Qeherman Îsa diyar kir ku piştî hilweşandina rejîma Baas hêviya hemû pêkhate û gelên Sûriyê hebû ku destûrek bê pejrandin li gorî daxwazên wan. Lê ragihandina reşnivîsa destûrî ya nû rengê Sûriyê di nav xwe nehewand û dûrî şêwazê demokratîk bû û got, “Aramiya Sûriyê hêzên QSD’ê ne.”

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Di 13’ê Adarê de Ehmed El Şeri “Danezana Destûrî” îmze kir. Komîteya Sazkirina Danezana Destûrî li Sûriyê ya ku ji hêla desthilata Şamê ve hatibû erkdarkirin, radestî serokkomar Ehmed El Şeri hatibû kirin û wî jî îmze kir. Destûr ji gelek bendan pêk tê û ji wan bendan ew e ku qonaxa veguhêz ya desthilata Şamê 5 sal e. Di danezanê de hate diyarkirin ku fiqha îsmalê çavkaniya bengehîn a qanûnê ye. Herwiha di danezanê de tê gotin ku mafê Meclisa nûneran heye ku lêpirsîna wezîran bike û di dema veguhêz de jî desthilata rêveberî di destê serokkomarê de ye. Di heman demê de desthilata dadweriyê serbixwe ye, dadgehên awarte qedexe ye û dadwerî tenê girêdayî qanûnê ye. Herwiha hat ragihandin ku dadgeha destûrî ya heyî hat fesixkirin û mafê destnîşankirina dadgeha destûrî ya nû ji mafê serokkomar e.

**Danezana destûrî bi pîvanên hikumeta Baasê ye**

Danezana destûrî, derket, lê bendên wê danezanê bi pîvanên ku hikumeta Baas’ê bi kar dianî, yek in. Di vê danezanê de tu nîşane, ruhê gelê Sûriyê û pêkhateyên wê ji kurd heta bi ereb, suryan, asûrî û hwd… ji pêkhateyên Sûriyê, tune ye. Ev danezan rastiya nasnameya resen a gelê Sûriyê temsîl nake, bendên wê jî dûrî hêviyên gelê Sûriyê ye. Destûra rast ew e ku gelê Sûriyê xwe di nav de bibîne û demokratîkirina pêkhateyan mayînde bike. Ji ber ku piştî hilweşîna rejîma Baas di 8’ê Kanûna 2024’an de, Sûriyê rûbirûyî astengiyên mezin hat û hîna jî li hin herêman tundî didome û welat êşên salên şer dikişîne. Danezana destûrî ya dawî jî, pêwîs bû ku gaveke ber bi pêkanîna armancên gelê Sûriyê ba, lê wê danezanê hêvî têk birin û berovajî armancên gelê Sûriyê yên jinûveavakirina Sûriyê bi rengê demokratîk.



Derbarê Danezana Destûrî ya desthilata Şamê, Parêzer Qehrman Îsa ji rojnameya me re axivî.

**‘Li gorî destûrê nû wê dîsa dîktatoriyeke nû çê bibe’**

Qehrman Îsa diyar kir ku Danezana Destûrî ya desthilata Şamê yek renge û wiha got: “Em dizanin hatina serokê nû Ehmed El Şeri bixwe ne bi rengê hilbijartinê bû. Herwiha reşnivîsa destûrê nûjen a ku hate ragihandin û erêkirin ji bû serokê hikumeta nû ya desthilata Şamê Ehmed El Şeri yek reng bû. Di vê reşnivîsa destûrî de gelek xalên li dijî mafê mirovan, zangonên heyî, bingeh û şêweyê demokratiyê hene. Reşnivîsa vî destûrî rengê gelê Sûriyê, daxwaz û astengiyên wan yên ku di salên şer û aloziyê de jiyan kirine, neda xuyakirin. Ji ber ku piştî hilweşandina rejîma Baas hêviya hemû pêkhate û gelê Sûriyê hebû ku destûreke bê pejrandin li gorî daxwazên wan be. Lê tê xuyakirin li gorî destûrê nû wê dîsa dîktatoriyeke nû çê bibe. Bi nîvisandina vî destûrî, qelenê giranbuha ku gelê Sûriyê di van 14 salan de daniye, beyhude çûn. Pêkhateyên Sûriyê yên cûrbicûr xwe di Danezana Destûrî de nabînin. Ji hêla din ve jî hemû serokkomar di destê xwe de hiştine û wê ew encûmena zagonsaz, meclis teşrîyî hilbijêrin, di pêşerojê de jî heger ev serokkomar şaştiyek kir kesê ku wî ceza bike di destûr de tuneye.”

**‘Danezana Destûrî dûrî şêwazê demokratîk e’**

Qehrman Îsa da zanîn ku xala bala wî kişand ew e ku li gorî Danezana Destûrî çavkaniya sereke ji bo zangonên welat feqa islamî ye û wiha got: “Xala ku gelekî bala min kişand ew e ku dibêje Fiq El-islamî çavkaniya sereke ji bo zagonên vî welatî ye. Ev yek dûrî daxwazên hemû pêkhateyên Sûriyê ye û li dijî şêwazê demokratîk e. Ev destûr ne rengê gelê Sûriyê ye û em vî destûrî napijrînin. Divê ji danezana destûrî re lêvegerk çêbibe û di reşnivîsa destûr de jî hemû pêhateyên Sûriyê beşdar bibin. Herwiha komîta ku bê avakirin jî, divê hemû pêkhate li ser nerîna xwe bidin.”



**‘Hikumeta nû ne bi xwe û ne jî bi gelê Sûriyê re raste’**

Qehrman Îsa eşkere kir ku berî ragihandina reşnivîsa destûr hevpeymanek di navbera dû hêzên sereke li Sûriyê pêk hat û wiha got: “Dema ku em bixin bin mîkroskopa qanûnê de hevpeymanek pêk hat, berî ku reşnivîsa destûrî bê nivîsandin, ew hevpeyman di navbera Fermandarê giştî yê QSD’ê Mezlûm Ebdî û serokê desthilata Şamê Ehmed El Şari de çê bû. Di wê hevpeymanê de hatibû diyarkirin ku wê mafê hemû pêkhateyan di destûr de bê parastin û agirbest li Sûriyê pêk were, lê em dibînin heya niha li Bendava Tişrînê şer nehatiye rawestandin. Di heman demê de di hevpeymanê bi xwe de hatibû diyarkirin ku wê mafê civaka kurdî bê parastin. Lê di destûr de ne mafê civaka kurdî û ne civakê din jî nebûn. Ev tê wê wateyê ku hikumeta nû ne bi xwe û ne jî bi gelê Sûriyê re raste.

Herwiha bi şêwazê qanûnî em dibêjin nîvîsara taybet nivîsa giştî sînordar dike. Nîvîsa giştî destûre, beriya ragihandina vî destûrî, hevpeyman di navbera di hêzên sereke di Sûriyê de çê bû, aramiya Sûriyê bi giştî bi vê hevpeymanê ve girêdayî bû, jêderê vê hevpeymanê gerek bandora xwe di destûr de heba.”

**‘Aramiya Sûriyê hêzên QSD’ê ne’**

Qehrman Îsa axaftina xwe wiha qedand: “Daxwaza min ew e ku hemû gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe li dor Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê kom bibin. Ji ber ku yê aramiyê di Sûriyê de pêk bîne hêzên QSD’ê ne. Ya din jî hemû gel davkevin kolanan û bêjin em vê reşnivîsa destûrî red dikin û divê destûrekî temsîla gelê Sûriyê bike ku demokratî û wekhevî di nav xwe de dihewîne, hewiha berjwendiyên pêkhateyên Sûriyê biparêze, were çêkirin.”

# ‘Ji bo serxistina pêvajoyê divê Rêber Apo azad bibe’

**Zana Roj/ Qamişlo**

**Endamê Însiyatîfa Parêzerên Sûrî a Parastina Abdullah Ocalan Parêzer Xalid Omer da zanîn ku ger Tirkiyê di mijara Aştî û Demokrasiyê de rast be, divê Rêber Apo azad bibe û got: “Em ê heyanî misogerkirina azadiya fîzîkî a Rêber Apo têbikoşin”.**



Piştî 26 salan ji berdewamkirina sîstema îşkence û tecrîdê li ser Rêber Apo, bi banga dîrokî a ji bo Aştî û Civaka Demokratîk Rêber Abdullah Ocalan bi guhartinên cidî derket pêşberî gelê Kurd û cîhanê. Lê dewleta Tirk bi pêvajoya nû re tu mafên hêviyê ango azadkirina Rêbertî dernexistin. Girêdayî vê mijarê Parêzer Xalid Omer ji rojnameya me re axivî.

**‘Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo mercê bingehîn e’**

Parêzer Xalid Omer di destpêkê de diyar kir ku piştê pêvajoya Aştê û Demokrasiyê derketina Rêbber Apo bûye şert û wiha got: “ji bilî sûdwergirtina ji mafê hêviyê ya ku di pêvajoya nû de hatiye pêşxistin. Dem dema Azadiya Fêzêkî a Rêber Apo hatibû. Li ser vî esasî divê Rêber Apo azadiy axwe fîzîkî bidest bixe. Dewleta Tirkiyê di vê demê de divê ji nû ve darizandina Rêber Abdullah Ocalan bike, da ku biryara cezaya girtinê ya heta hetanî were guhartin û serbest bê berdan. Lê bi taybet piştî pêvajoya Aştî û Demokrasiyê a ku Rêber Apo destpêkiriye. Êdî mijara azadiya fîzîkî a Rêbertî bûye şert li ser Tirkiyê. Niha dewlet aTirk bi riya însiyatîfa ku ji dewlet Bahcelî destpêkiriye yekser Rêber Apo muxatab girt. Êdî ew nikarin înkar bikin ku Rêbertî temsîla îradeya gelê Kurd dike. dema Deweleta Tirk vê rastiyê dibîne û ger cidî be di mijara çareserkirina pirsgirêka Kurd û Tirkiyê bi rêya diyalogê re; divê Rêber Apo ya ku pêşengtî ji vê serdemê re kiriye muxateb bigre û ji zîndanî derxînin.”

**Ji nû ve darizandina Rêber Apo**

Xalid da zanîn ku divê ji nû ve darizandina Rêber Apo bê kirin û wiha domand: “Niha li gorî yasayên Tirkiyê kesên ku tên darizandin û bi sûcên terorê tên girtin re biryara dîlgirtina heta hetanî lê tê birîn û sûdê ji mafê hêviyê nagrin. Ger sûd ji mafê hêviyê girtin jî divê piştî 30 salî ji girtinê be. Di demên dawiyê de gelek girtiyên Tevgera Azadiyê jî hatin serbest berdan her yek jî zêdetirî 31 salan ceza girtibû.

Lê belê rewşa rêber Apo gelekî cuda ye, bi taybet piştî banga Aştî û Demokrasiyê. Ger dewleta Tirkiyê li hember pêvajoyê cidî be. Erka ku dikeve ser mile dewleta Tirkiyê divê Rêber Apo ji zîndanê derxîne, şert û mercên jiyanê yên guncav bê amedekirin. Her wiha danûstandinên û têkilî bi Rêbertî re serbest bêne kirin. Li ser vî esasî divê ji nû ve darizandin çêbibe. Di mijara yasayan de a Tirkiyê û hin dewletan de divê hin guhartin bêne çêkirin da ku ji nûve darizandin bê kirin û cezayên ku hatine birên werin rakirin.”

**‘Heyanî misogeriya azadiya fîzîkî em ê têbikoşin’**

Parêzer Xalid Omer di dawiya axaftina xwe de tekez kir ku wê têkoşîna li hember têkbirina tecrîdê bernedin û wiha got: “Em jî weke Parêzer dibêjin ku hê jî tecrîd li ser Rêber Apo heye û nehatiye rakirin. Têkildarî mijara têkibirina tecrîdê û azadiya fîzîkî ya Rêbertî, endamên insiyatîfê û bi hemleya cîhanî ku bûye du sal ji bo Rêber Apo hatiye destpêkirin. Xebatên me neyahtine sekirinan dosyaytên taybet ji bo rewşa Rêbertî hatin amedekirin û ji aliyên têkildar re hatine şandin. Her wiha em ê dev ji têkoşîna xwe ya ji bo misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bernedin”.